

Rûnahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :440 nameronahi@gmail.com 26- Tebax - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Ji hezkirina mirinê hatin eşqa jiyanê









**Medya XANIM**
**Werger ji Erebî: Melek DEMÎRTAŞ**

Zarokên di nav baxçeyê jiyan û civakê de mîna gulan ji dûrî şer, kuştin û xwînê dijiyan, lê ji hişmendiya kor û tarî ku ji çanda mirin û xwînê hezdikin ew zarok ji mafê zaroktiyê û pêşeroja wan li ser zinarekî ketî hiştin. Lê ev zarok û pêşroja wan ji hêla kesên ku ji jiyan û azadiyê hezdikin hatin xelaskirin.

Neviyên DAIŞ'ê ango zarokên DAIŞ'ê- Çawa ji hêla çeteyên DAIŞ'ê dihatin perwerdekirin û tecnîdkirin û wan zarokan ji bo ahengên xweyî nejadperst û olperst bi kar tanîn. Di heman demê de di navenda Horî ya parastin û hînkirina zarokan li Herêma Cizîrê bi şêwazên zanistî û mirovî zaroktiya wan divegrînin û pêşerojek nû avadikin.

Ew gotinên di pankarta navendê bala me kişand, ji ber ku ew nîşaneya xwediyên ku Rojava û Bakurê Sûriyê bi fikr û felsefeya Netewa Demokratîk Rêvedibin. Ku ew li vir jiyanek nû dûrî kuştin, nejadperestî, cûdahiya mezheb û ol avadikin, lê belê her însan şaşdibe lê ya girîng ku şaştî çawa û bi çi şêwazş sererast bike û dûrxe. Ji ber ku DAIŞ'ê ew zarok ji bo mîna alava kuştin perwerde dikrin. Lê li Navenda Horî ya Parastin û Perwerdehiya Zarokan li Tel Marûf girêdayî Kantona Qamişlo ji bo jiyan, hezkririn û hevkariya hevbikin, hîndibin.

### EM BI HEVRE PÊŞEROJA ZAROKAN AVABIKIN

Zarokê bi navê Nasir Hemûd ji bajarê Reqayê piştî ku dev ji dibistanê qeriya û bi xalê xwe di dukana tamîrkirina dixebitî, di sala 2017'an de tevlî çeteyên DAIŞ'ê bû. Dem ku pêleya şoreşê gihişte bajarê wan Nasir û malbat xwe koçberî Tirkiyê bûn û piştî ku DAIŞ'ê bajarê Reqayê dagir kirin ew vegriyan û li vir çîroka tevlî bûnê dest pêdike. Nasir da zanîn ku kurê apê wî tevlî DAIŞ'ê bû, ji bo ku min jî tevlî bike her behsa peran dikir da ku bandor bike ku mûçêye wî 50 dolarin. Di dawî de pilana kurê apê wî pêk hate û Nasir tevlî çeteyên DAIŞ'ê bû. Perwerdey leşkerî li kampa bi navê "Karûbarên Dewleta Helebê bû". 20 rojan waneyên Şerîta islama radîkal ser destê çeteyê bi navê Ebdilrehman Al-Tunisî û Ebû Abdul Rahman Al-Hûmsî ji dîtin, her wiha em 30 zarokên bi temenê cûda bûn."

Hemûd wiha dewam kir: "Piştre gotin em çend kesên xwe kûj dixwazin, ez û 6 zarok derketin û me berê xwe da bajarê Hemayê em nêzî 50 zarok me perwerdeyên xwe li şikeftên wir dîtin. Perwerdeyên me ser bi kar anîna çek, operasyonên cûda bûn, çeteyê ji Endenozya koda wî Aba Bekir Endonozî û yêdin ji Himsê ji herêma Hewla bi navê Eba Bekir El- Himsî yê serkêşa kampa perwerdê dikirin. Di hundirê perwerdê dê di serê me de di çandin ku kurd mîna rêjîmê kafirin û ji bo wê hûn li kur wan bibînin divê wan bikujin, xwe biteqînin û çi bikin ama nekevin destê wan de."

Hemûd da zanîn ku berî ku tevlî bibe dît ku çawa seriyên jêkirî tanîn û bi dewara El-Neyîm ya li Reqayê ve dikirin û piraniyên xwediyê wan seriya tîma 17 leşkerên girêdayî rêjîmê bûn. Piştî bi dawî kirina perwerdê em çûne Tebqayê û piştî çend rojan Tebqa ji hêla QSD'ê hate dorpêçkirin, di wê demê ez amedebûn ku xwe di nav wan de biteqînin. Lê ez birîndar bûn ji bo wê reviyam, lê QSD'ê em girtin. Nasir Hemûd wiha pêde çû: "Piştî ku QSD'ê ew girtin derman kirin, piştre ji bo lêpirsînê ew birin Kobanê û 5 mehan li girtîgeha wir ma şûnde emalyat ji lingê wîre çêkirin û piştre ew veguhetin Herêma Cizîrê li navenda Horî û li wir jî amelyatek din jêre çêkirin."

Nasir da zanîn ku ew 11 mehin li vê navendê ye, di navbera van mehande di hemû hêlande hatin guhertin û fêrî waneyên exlaq û çand bû û rastî ji şaştiyê naskir bûn kesekî cûda ji berê. Taybet piştî ku me rê û rêbazên wan yên herî xweş dît bervajî ku çeteyên DAIŞ'ê di mêjiyê me diçandin". Nasir di dawî de tekez kir ku piştî mehkumiya xwe ya sê salan bi dawî bike wê pêşerojek xwe durî polîtîya kuştin û xwînê avabike."

### HATİN MEKA YA MUKERMÊ

Di çarçoveya hevdîtinên me bi zarokan re em rastî zarokekî ji Endenozya yê hatin ew bi bav, dê, kalik û xweşka xwe ji welatên dur bi armanca serdana "Mekayê hatin xaka Rojava û Bakurê Sûriyê. Û wiha got: "Navê min Celal 15 salî me ji Endenozya yê hatin Tayland piştra Tirkiyê û çend seatan li Xazî Entîbê man piştre em hatin Cerablûsê û dawî em gihiştin Reqayê. Ev hemû jî bi sedema hevalekî bavê min ji Sûriyê bû ku her jêre digot "werin Mekê".

Celal wiha axaftina xwe dewam kir: "Dema ku em gihiştin Sûriyê temenê min 13 salî bû, piştre em çûne Himsê li wir em 20 zarokê Endenozî ji temenê 10 heya 15 salî bi fonê 10 hezarê PS derbasî kampa perwerdeya leşkerî ya Eşbalê Xelîfetê bûn. Li wir ji hêla çeteyekê em fêrî bi kar anîna çek û zimanê erbî û qurana pîroz kirin, her wiha me ferî çawa jêkirina seriyan bikin dîmenên çeteyên ku serê mirovan serjêdikirin pêşme dikirin û her di gotin ku kurd kafrin û pêwîste hûn wan bikujin." Piştre em çûne gundê Sor li Dêra Zorê û li wir ji hêla istixbaratên Hêzên Sûriya Demokratîk ve hatin girtin, û dayika min li gundê Şiyîtat yê Dêra Zorê bi nexweşiyê ber girtina min bi mehekê wefat kir û bavê min jî niha di girtîgehekî li Herêma Cizîrê deye."

Celal serpêhatiya xwe wiha domand: "Di dema ku em li Endenozya bûn bavê min di tamîrkirina maşîneyan de dixebitî, li vir şervanê çeteyan û tamîrkirinê maşîneyên wan dike, Kalik û xwişka min jî li kampek taybet ji bo malbatên çeteyan li Rojava dene. Tenê daxwaziya min heye ku ez têkîliyê bi xwişk û kalikê xwe re bikim. Û wiha pêde çû: "Ez li navenda Horî de di rewşk gelek baş de me, her wiha fêrî zimanê kurdî dibim lê dixwazin hîn baştir fêr bibim. Em perwerdeyên fikir û exlaq dibînin di riya van perwerde ez hatim guhertin û ew mêjiyê nejadperst û olperstî yê ku çateyan di mêjiyê me çandibûn avêt. Piştî ku cezayê min xeilas bû dixwazim vegerim welatê xwe û xwendina xwe temem bikin da ku bibin bijîjk anjî lîstikvanê fotbolê."

### BAVÊ KU LAWİKÊ XWE FÊRÎ SERJÊKİRİNA SERİYAN DİKE

Di çarçove anjî di jîngeha ku zarok têde hînî jiyanê dibin bandor lê dike. Bav bi sê jinan re zewicye û ew Emîrek çeteyên DAIŞ'ê ye, lawikê wî dibîne bê çawa serê mirovan jêdike, wê ev zarok ser çi ramanê nejadperst û paşvrutiyê û derûniyê mezin bibe?? zarokê bi navê Mueyed Hesen di bihra temenê xweyî 14 salî li Dêra Zorê jidayîk bûye lê li Tebqayê jiyan kiriye, serp hatiyên xwe û çawa tevlî refên çeteyên DAIŞ'ê bû û diriya kî de??.

Çîroka Mûeyed Hesen jî eve: "Ez di temenê 11 salî de di riya bavê xweyî ku Emîrê çeteyên DAIŞ'ê tevlî bûm, min perwerde li Girê Sipî û gunde warên wê bi 80 zarok û yek ji Ferensî bû li sê kampên leşkerî dît û yê ku em perwerde kir çetê bi navê Ebû Ubêd El-Misrî me ser waneyên şerîa û çek fêrkir û ya girîn ku di her demê di gotin kurd kafrin."

Piştî bi dawîkirina perwerdê, min tevlî ketîbeya "Umer Binî Xetab" kirin ku zarokên temenê cûda di nav de cih digrtin û li wir min dît bê çawa seriyê niştcihê Tebaqyê bi suçe ku girêdayî rêjîmê çeteyê Ebî Nûr ew jî emîrê ketîbe serê wî jêkir." Heman dîmen li gel bavê xwe jî dît, dema ku serê sê leşkerên rêjîmê li pêşiya çavên min jêkir. Her wiha bavê min ji mire digot ev tiştekî normale divê ez ji van tiştan netirsim, jiber ku armanaca wî ez fêrî jêkirina seriyan bim. Bavê min sê jinên Êzdî kirîbû û wî yek ji wan jinên Êzdî wekî diyarî da yêkî ji Hesekê."

Mûeyed bal kişand ser operasyona girtinê û wiha got: "Di dema ku ez diçim Tebqayê da ku serdna dayîk û xweşkên xwe bikim, ez ji hêla istixbaratên Hêzên Sûriya Demokratî ve hatim girtin. Ji wir min radestî bîroya lêpirsînê kirin nêzî du mehan di girtîgeha Tebqayê de û rojekê li Kobanê mam şûnde min guheztin Herêma Cizîrê li navenda Horî kirin."

Mûeyed diyar kir ku di navenda Horî de guherî û ferî jiyana azad bû û wiha dom kir: "Di vir de rewşa minî derûnî û ramyarî baştire, her wiha ez pir hatim guhertin û ew pêvajoya kuştin û serjêkirin jibîr kir û naxwazim ku vegerim bavê xwe û wê demê. Lê belê ezê vegerim dayîk û xweşkên xwe û ez dixwazim ku bibim lîstikvanê fotbolê."

### ARMANCA CİVAKEKE WEKHEV AVA BİKİN

Rêvebirê navenda Horî Misab Xelaf derbarê bername û çawaniya perwerdê ev tiştanî ziman: "Bernameya sibê ji demjimêra 7 dest pêdike, her wiha navê gityiyan tê girtin û şûnde di 30xuleyan werzîş dikin piştre di dem jimra 8 tande taştê dixwin. Her wiha di demjimêra 9 ande jî kesên xwendin û nivîsê nizanin wan hînî nivîs û xwendinê dikin. Musab wiha dom kir sîstem an jî rêxistina wan mîna sîstema dibistanane, zarokên qabilet û tiştên ku ew dixwazin li gorî wan fêrbibin jî heye. Di heman demê de jî pirtûkxaneyek mezin li hola perwerd heye û di her odeyekê de pirtûkxana biçûk heye ku çîrokên zarokan, pirtûkên zanistî û çandî da ku hînî zanistê bin. Her wiha dema tameşekirina televizyonê jî hatiye veqetandin, ku bernameyek taybet ji bo zarokan bi temenê 11 heya 14' de salî hatiye orgenîzekirin. Ku zarok filmên karton sêrdikin lê yên mezin bernameyên werzîşê û rêzefilmên civakî sêrdikin."

Xelef tekez kir ku ji bo serdana malabatên wan jî dem hatiye veqetandin û wiha got: "Demên ziyaretê roja Şemiyê ye, her wiha destur heye ku di rojên Sêşem û Çarşemê telefonî malbatên xwe bikin. Xelef bi rîr xist ku hijmara zarokên ku di navendê de70 zarokin û temenê wan ji 11 heya 17 salî ne, Ku piraniya wan bi mlbatên wanre hatin girtin, hind malabtên wan di şerde mirin û gelek zarokên bi vî temenê biçûk di dema ku bi çeteyên DAIŞ'ê re şerdikirin hatin girtin, di hemn demê de hind zarokên ku jibo xwe teqandinê amedekriribûn hatin girtin. Piranî ji herêm derdorin lê hind jî ji dewletên jiderve ne."

Musab Xelef dazanîn ku zagonên taybet ji bo bûyerên wiha ji hêla dadgehê heye û got: "Cezayê herê giran dema wê 7 salin, û ev hemû jî girêdayî rêbaz û şêwazê danûstandian wî girtiyê ye. Di heman demê de li gorî rêvebir û çavdêr û mamostên wan guhertinek erênî bi hişmendî û rêbazên wan ceza tê kêmkirin."

Musab bal kişand ser zehmetiyên navendê û got: "Zehmetiyên ku em dikşînin piranî jî jiber ku temenm wan piçûke, jibo wê jî guhdanek taybet ji ware pêwîste, lê mamoste û çavdêr rewşê kontrol dikin. Her hewldidin ku di wê navendê de ji zarokan re rewşekî malbatî bi afrînin, rastî jî jiber rêbaz û şêwazên rêvebir, çavdêr û mamosteyan bi zarokan re, di demek kurt de ku me texmîn nedikr guhertinek balkêş di hişmendî û danûstandan wan de çêbû."

Rûnahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 440 26- Tebax- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Gerîla li leşkerên Tirk xist



Li bakurê Kurdistanê di navbera hêzên gêrîla û artêşa Tirk de şer giran dibe. Gêrîla bi çalakiyên bi bandor derbêngiran li artêşa Tirk didin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir ku li gêrîla li bajarê Qersê li leşkerên Tirk xistine û leşker hatiye kuştin. *R-2*

# DAGIRKERAN GEL BÊZAR KIRIYE



**Dewleta Tirk û çeteyên xwe piştî ku Efrîn dagirkirin yekser dest bi kiryarên li dij mirovî kirin. Ev pênc mehin her roj bê navber leşker û çeteyên Tirk li dijî gelê Efrînê hemû rê û rêbazên qirêj bikar tînin.**

Dewleta Tirk ya hevkarê DAIŞ û El Qaîdeyê li pêş çavên hemû cîhanê li Efrînê sûcên mirovahiyê dike. Di bin navê Atêşa Azad de bi dehan komên çete yên bermahiyên El Qaîdê li Efrînê kom kiriye. Ev komên çete dest datînin ser mal û milkên gel, diziyê û destdirêjiyê dikin. Gelê Efrînê jî êdî li hember van kiryarên dagirkeran bê zar bûye û li ber wan radibe.

Hat ragihandin ku welatiyên gundê Satya yê Cindirêsê li hemberî kiriyarên çeteyan rabûne. Hat gotin ku di navbera welatiyan û çeteyan de şer derketiye û çeteyan gule bêserûber li gund reşandine. Hat ragihandin ku welatî bi israrin ku çeteyan ji gundên xwe derxînin. Ji aliyê dinve koma çete ya bi navê Lîwa Şah Silêman gefa li gel dixwe ku li dijî destdirêjiyên wan meşan lidarnexin. *R-2*

## NY komkujiyên DAIŞ'ê yên li Şengalê lêkolîn dike




Neteweyên Yekbûyî (NY) dest bi lêkolîna komkujî û êşkenceya ku çeteyên DAÎŞ'ê li Kurdên Êzidî û gelê sivîl ê li Iraqê kiriye, kir. Hate ragihandin ku lêkolînê di çarçoveya biryara Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî de dest pê kiriye. Biryar par bi yekdengî hatibû girtin. *R-5*

## Ciwan di rizgarkirina Efrînê de xwedî roleke mezin in



Yekitiya Ciwanên Rojava YCR'ê li gundê Aqîbê yê Şêrawa Efrînê bi beşdariya dehan ciwanan civînek lidarxist. Di civînê de Endamê Rêveberiya YCR'ê Harûn Apoyî axivî û bal kişand li ser rola ciwanan ya di rizgarkirina Efrînê de. Apoyî got, "Erka ciwanan e ku Efrînê rizgar bikin û tola şehîdan hilînin." *R-2*

## Tirkiye S-400'an bikirre wê li dijî polîtîka me be



Berdevkê Wezareta Karê Derve ya DYA'yê Heather Nauert derbarê kirrîna fuzeyên S-400 de ku Tirkiyê bi Rûsyayê re peyman mor kiriye got, "heke welatekî weke Tirkiyê yê endamê NATO'yê ye pergala S-400 bikar bîne, wê dijberî polîtîkaya me tevbigere. Wê li ser mueyîde bên kirin." *R-5*

## De Mîstûra Rûsya, Îran û Tirkiye vexwende Cinêvê




Nûnerê Taybet ê Sûriyê yê Neteweyên Yekbûyî (NY) Staffan De Mîstûra Rûsya, Îran û Tirkiye vexwende hevditinên li Cinêvê yên 11 û 12'ê Îlonê. Li gorî daxuyaniya ku berdevkê De Mîstûra daye, nûnerê taybet ê Sûriyê yê NY'yê bang li sê welatan kiriye ku ji bo destûreke nû ya Sûriyê were danîn, ji bo avakirina komîsyoneke peywirdar gotûbêj bikin. *R-5*

## Îdlib navenda El Qaîde û Ixwanî Muslimîne



Partiya Sûriya Paşerojê û Endamê Meclîsa wê ya giştî Îyad Xetîb diyar kir ku dewletên herêmî derbarê Idlibê de li ser rêbazekî taybet lihev nekirine. Xetîb da zanîn ku dewleta Tirk naxwaze Cebhet El-Nusra tune bibe û got, "Idlib weke baregeheke rêxistina El-Qaîdê û Ixwan Muslimîne ku alîkariya xwe ji Tirkiyê digirin." *R-4*

## PDK bila bersiv bide



Dewleta Tirk di 15'ê Tebaxê de êrîşa hewayî dijî Şengalê pêk anî û di encamê de Endamê Koordînasyona Civaka Êzidî û Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Zekî Şengalî şehîd bû. Li ser bêdengiya PDK'ê Endamê Tevgera Nifşê Nû Hewraman Secadî axivî û got, "Divê PDK bersiv bide, bi vê êrîşê re buye alîkar an na." *R-4*

## Wezîrê Tirk ji bo Îdlibê li xwe mikur hat



Di demeke ku rejîma Sûriyê amadekariya operasyona li dijî Îdlibê dike, Wezîrê Karên Derve yê Tirk Mevlûd Çavûşoglû li Moskowayê bi Wezîrê Karên Derve yê Rûs Sergey Lavrov re rûnişt. Çavuşoglû li xwe mikur hat û da zanîn ku li Îdlibê hin komên radîkal gelê sivîl aciz dikin. Ev gotin weke nîşana lihevkirinê hat şîrovekirin. *R-4*

## Spanyayê 116 penaber dersînor kir

Li welatên rojavayê Ewropayê kiryarên li dijî penaberan roj bi roj zêde dibin. Hat ragihandin ku Spanyayê 116 penaberên Afrîkayî yên roja Çarşemê radestî Fasê kir. Rêxistinên mafên mirovan diyar kirin ku rêveberiya Madrîdê bi vê dersînorkirinê re sûc kiriye. *R-2*

# Efrîn serî li ber dagirkeran natewîne

**_Gelê Efrînê li berxwedana xwe ya li hember dagirkeran mezin dike. Li Efrînê wehşet û hovîtiya leşker û çeteyên dewleta Tirk a dagirker êdî gel bê zar kiriye. Li hember kuştin, revandin, dizî, talan û destavêtinê ya dagirkeran êdî dadikeve kolanan û meş û xwepêşandanan lidardixe._**



Gelê Efrînê li dijî kiryarên hovane yên leşker û çeteyên dewleta tirk a dagirker radibe û serî natewîne. Li hember zilm û zordariya dagirkeran gelê Efrînê di nava têkoşîn û berxewdanê de ye.
Şêniyên gundê Satiya ya girêdayî herêma Cindirêsê li hemberî kiriyarên çeteyên artêşa tirk a dagirker serî netewandin û li hemberî wan derketin.
Çavkaniyekî ji gundê Satiya ragihand ku çeteyên Firqet El-Hemzat a girêdayî artêşa tirk a dagirker mal û milkên welatiyên gund dizin. Heman çavkanî diyar kir ku li hemberî kiryarên çeteyên artêşa tirk a dagirker, şêniyên gund serî netewandin û li hemberî wan derketin. Di encamê de, pevçûn di navbera şêniyan û çeteyan de derket. Çeteyan gule bê serûber li gund reşandin.
Çevkanî tekez kir ku şênî ji bo derxistina çeteyan ji gund bi israr in. Li gund heta niha rewş ne aram e.

## Spanyayê 116 penaber dersînor kir



116 penaberên ku xwe li herêma Ceaûta ya Spanyayê digirtin, di nava 24 saetan de li Fasê hatin vegerandin. Rêxistinên mafên mirovan diyar kirin ku rêveberiya Madrîdê bi vê dersînorkirinê re sûc kiriye.
Li welatên rojavayê Ewropayê kiryarên li dijî penaberan roj bi roj zêde dibin. Yek ji rojnameyên rojane yên Spanyayê “El Paîs” ragihand ku rêveberiya Madrîdê 116 penaberên Afrîkayî yên roja Çarşemê xwe li Ceaûta girtibûn piştî rojekê radestî Fasê kir.
Spanyayê beriya niha penaberên ji bakurê Afrîkayê xwe digihandin Ceaûtayê, piştî çend mehan digirt nava welêt û serlêdana wan a penaberiyê lêkolîn dikir. Lê rêveberiya Spanyayê dest ji vê nêzîkatiyê berda û yekser radestî welatê transît Fasê kir.
Tê gotin ku penaber bi komên ji 10 kesî hatin dersînorkirin. Hem biryara dersînorkirinê hem jî şîdeta polîsên Spanyayê ya ji bo dersînorkirinê rê li ber nerazîbûna penaberan vekir. Li gorî agahiyên ku di çapemeniya Spanyayê de hatin weşandin, di dema dersînorkirinê de şer derketiye û polîsan hewl dane penaberan bi darê zorê bişînin.

## Gerîla li leşkerên Tirk xist



Hêzên gerîla li bejahiya navçeya Qaqizman a Qersê li leşkerên Tirk xistin. Di encamê de herî kêm leşkerek mir, 4 leşker jî birîndar bûn.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG’ê daxuyaniyeke nivîskî weşand û li ser çalakiyên vê dawiyê yên gerîla agahî da.
Di daxuyaniyê de hate gotin: “Di çarçoveya Pêngava Serketina Şoreşgerî de ku li gelemperiya Eyaleta Serhedê dest pê kiriye, hêzên me roja 14’ê Tebaxê saet 16:30’î li dijî yekîneyeke artêşa TC a dagirker ku hewl dida li mintiqeya Tepê Reş a li herêma Kizil Kîlîse ya navçeya Qaqizman a Qersê bi cih bibe çalakiyeke sabotajê pêk anîn. Li gorî agahiyên gihîştin ber dest, herî kêm leşkerek hate kuştin, 4 leşker jî birîndar bûn.

## Ciwan di rizgarkirina Efrînê de xwedî roleke mezin in



Têkildarî rola ciwanan di piştgiriya Berxwedana Serdemê û Pêngava Rizgarkirina Efrînê de civînek li gundê Aqîbê yê navçeya Şêrawa ya kantona Efrînê hate lidarxistin.
Civîn ji aliyê Yekitiya Ciwanên Rojava ve (YCR) bi amadbûna bi dehan ciwanên gundê hate lidarxistin.
Rêveberê Yekîtiya Ciwanên Rojava Harûn Apoyî di civînê de axivî û girîngiya lidarxistina Kongreya Rizgarkirina Efrînê anî ziman. Harûn anî ziman ku di bendên kongrê de bal hatiye kişandin li ser rola ciwanan di rizgarkirina EFrînê de û wiha got, “Li ser vî esasî me xwe amade kiriye, me gelek civîn li ser rola ciwanan di pêngava rizgarkirina Efrînê de li dar xistine.”
Apoyî daxwaz ji ciwanan kir ku erka xwe ya piştgiriya Efrînê pêk bînin û tola şehîdan rakin.
Harûn Apoyî da zanîn ku pêwîste ciwan xwe bi rêxistin bikin û rêxistinên xwe ava bikin, da ku ji her rewşê re amade bin.
Ciwanên Rojava wê li Şehbayê jî civînên bi vî rengî li dar bixin.

## Dagirkeran Efrîn vegerandine sergoyê



Piştî ku artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê Efrînê dagir kirin, êdî Efrîn bûye cihê komkirina sergoyê û zibal li hemû kolanên wê belav bûye.
Piştî ku artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê bajarê Efrînê dagir kirin, mal û milkên welatiyan, alavên saziyên giştî yên xizmetguzariyê talan kirin û dest bi revandina sivîlan kirin û li beramberî berdana wan pereyên zêde dixwazin.
Bi demê re bajarê Efrînê bûye cihê komkirina çopê. Di demên dawî de gelek wêne yên kolana sereke ya bi navê kolana Raco tê naskirin li ser t tevna civakî belav bûn û zibal li wê derê kom bûye.
Li gorî çavkaniyekî ji bajarê Efrînê ragihand, Efrîn ji ber zibalê ku nayê komkirin di bin qirêjê de maye. Çavkanî destnîşan kir ev rewş ne tenê li Efrînê ye lê hemû herêmên ku dewleta tirk û çeteyên wê dagir kirine wisa ne û tu xizmet li wan deveran nayên kirin.
Ji aliyekî din ve jî çavkaniyekî ji navçeya Şiyê ya Efrînê ragihand ku çeteyan sewalên welatiyên navçeyê ji wan stendine û wan serjê dikin û bi navê ku alîkariya koçber û şêniyan dikin goştê wan li şêniyan belav dikin. Bi vê yekê hewil didin ku nîşan bidin ew alîkariya welatiyan dikin…*ANHA*

## Komên Qasim Şeşo ekîba Çira TV asteng kir

Xebatkarên Çira TV ku xwestin Cejna Cema ya Êzidiyan bişopînin ji aliyê komên çekdar ên Qasim Şeşo ve hatin astengkirin.
Gelê Êzidî li Mezargeha pîroz a Şerfedîn ya li Şengalê ev 2 roj in ji ber Cejna Cemayê li hev dicivin û pîrozbahiyan lidar dixin.
Duh xebatkarên Çira TV’yê xwestin pîrozbahiyan bişopînin lê hêzên çekdar ên Qasim Şeşo rê nedan ku tîma Çira Tv pîrozbahiyê bişopîne.
Bi fermana Qasim Şeşo destûr nehate dayîn ku xebatkarên TV’yê pîrozbahiyê bişopînin, hêzên çekdar ên Qasim Şeşo dest danîn li ser amûrên xebatkaran lê piştî nerazîbûnê neçar man amûran radestî wan bikin. Hate diyar kirin ku hêzên çekdar ên Qasim Şeşo dixwazin Mezargeha pîroz a Şerfedîn ya Êzidiyan veguherînin baregeheke leşkerî.



# Dengê resen yê çiyayên Efrînê

**_Hunermend Ehmed Xanî yek ji dengên resen yên çiyayê kurmênc e. Hunermend Xanî dibêje, “Beriya Şoreşa Rojava me nediwêrî em stranên gelêrî bêjin. Şoreşê her tişt di hundirê me de azad kir. Dengê me azad bû, dilê me azad bû û fikra me azad bû.”_**




Dengbêjê stranên destan û efsaneyên lehengiya gelê Kurd Ehmed Xanî hewl dide bi riya hunerê kevneşopiya bav û kalên Efrînê biparêze.
Dengbêj Ehmed Xanî ji gundê Keferromê yê girêdayî navçeya Şera ya kantona Efrînê ye. Di nava dengbêj û hunermendan de bi dengê xwe yê çiyayî û bi denbêjiya xwe ya resen tê nasîn. Ehmed Xanî 11 albûmên xwe yên stranên folklorîk û kevneşopî tomar kirine.
Ehmed Xanî di 8 saliya xwe de dest bi stranên folklorîk dike û bi dengbêjên kevin ên Efrînê weke Evdê Şehrê, Hesen Nazî bi bandor dibe û beşdarî gelek şahiyên netewî yên weke cejna Newrozê dibe.
Ehmed Xanî yekemîn albûma xwe bi navê “cûreyên folklora kurdî” di sala 2000’an de tomar dike.
Di pêngava şoreşa Rojava de Ehmed Xanî cihê xwe di nava xebatên Desteya Çand û Hunerê ya Efrînê de digire û gelek stranên şoreşgerî û derbarê berxwedana Serdemê ya Efrînê û Kurdistanê de çêdike. Ehmed Xanî niha cihê xwe di rêveberiya Yekîtiya Hunermendên Kurd de digire û li kantona Şehba dimîne.
Ehmed Xanî li rex şervanên YPG’ê û YPJ’ê bi stran û dengê xwe li dijî êrîşên artêşa Tirk a dagirker û komên çete yên girêdayî wê li ber xwe dide. Piştî ku artêşa Tirk êrîşîa xwe li dijî Efrînê da destpêkirin welatiyên gelek gundên nêzî sînor berê xwe dan navenda bajarê Efrînê û Ehmed Xanî li nava van malbatan re digeriya û stranên efsaneyî û destanên Kurdan ji wan re digotin.
Ehmed Xanî di van demên dawî de stranek bi navê “Lêxe YPG’ê Lêxe” derxist û têde berxwedana bav û kalan li dijî dagirkeran bi berxwedana serdemê ve girêdide. Di roja duyemîn a êrîşa Tirkiyê li dijî gundên Meydana ya devera Reco de, Ehmed Xanî klîpek li gundên Meydana de kişand û di bin êrîşa balefiran de dîmenên xwe kişandin.
Ehmed Xanî niha di kampa Serdem de dimîne û bi stranan êşa gelê xwe parve dike.
Dîroka kurdan devkî ye ji ber ku nivîsandina dîrokê qedexe bû
Ehmed Xanî wiha got: “Min stranbêjiya resen a kurdî pejirand da ku ez folklor û kevneşopiya bav û kalan biparêzim ku li ber jibîrkirinê ye”. Ehmed Xanî Kurdistanê di stranên xwe de weke yar bi nav dike û dibêje ku di serdema sîstemên deshilatdar de gotina Kurdistan qedexe bû û ji ber vê yekê piraniya dengbêjan navê Kurdistanê bi navê Yar diguhertin.
Xanî anî ziman ku dîroka Kurdan a devkî ji aliyê hunermend û rewşenbîran ve hatiye parastin û sedema wê jî qedexekirina nivîsandina dîroka kurdî bû û wiha got: “hin ji dîroka nivîskî ya kurdî ji aliyê sîstemên desthilatdar ve hatiye nivîsandin û li borî daxwazên xwe nivîsandine”.
Der barê şoreşa 19’ê Tîrmehê de Ehmed Xanî wiha dibêje: “Şoreşê her tişt di hundirê me de azad kir. Dengê me azad bû, dilê me azad bû û fikra me azad bû. Beriya şoreşê me nediwêrî stranên folklorîk bêjin.”
Xanî soza da ku wê xebatên xwe heta rizgarkirina axa Efrînê berdewam bike û wê stranên xwe der barê êşa welatiyên Efrînê de çêbike.
Dengbêj Ehmed Xanî bang li hunermendên Kurd ên li seranserî cîhan kir ku piştgiriya berxwedana Serdemê ya Efrînê bikin…*ANHA*

## Qesra El-Binat wê were sererastkirin



Bajarê Reqayê ji aliyê şûnwarên dîrokî ve cihekî dewlemend e. Mîrên Ebasiyan ji ber xweza, hewa û cihê Reqayê yê balkêş gelek şûnwar ava kirin. Ji wan Qesir El-Binat ango Qesra Keçikan e. Ji destpêka aloziya Sûriyê ve qesir gelek zerar dît.
Çeteyên DAIŞ’ê dema Reqa dagir kirin, şûnwarên bajêr talan û wêran kirin. Di nav de Qesir El-Binat jî hebû. Çete beşek mezin ji qesrê şewitandin û her wiha ji ber rewşa hewayê gelek zirar dît.
Qesir El-Binat a ku bi navê Qesra Ebasiyan tê naskirin, li başûrrojhilatê bajarê Reqayê ye.
Qesir di sala 772’yan di serdema El-Mensûr de ji madeya gêç, El-leben û heriya ku li ber tava rokê hatiye zûhakirin di hatiye avakirin û di serdema Harûn El-Reşîd de jî bi dawî dibe.
Harûn El-Reşîd 12 salan tê de bi cih dibe. Qesir ji şûnwarên herî sereke yên dema Ebasiyan e.
Qesir ji qadek çargoşe pêk tê. Ev qad dabeşî 4 eywanan dibe. Li her goşeyekî bircek û di navîna qadê de avreşînek heye.
Her wiha sê deriyên qesrê hene. Di qesrê de 2 dibistanên mezheba Şafiî û Henefî û nexweşxaneyek ku ji aliyê Nûreddîn El-Zenkî ve hatiye ava kirin hene.
Di 4’ê Tîrmeha sala borî de şervanên QSD’ê Qesir El-Binat ji çeteyên DAIŞ’ê di pêngava rizgarkirina Reqayê(Xezeba Firatê) de rizgar kirin.
Tê payîn ku Gerînendetiya Şûnwaran a girêdayî Meclisa Sivîl a Reqayê piştî sererastkirina Sor El-Reşîd û Mûzexaneya Şûnwaran bidawî bike, wê dest bi sererastkirina Qesir El-Binat bike…*ANHA*



## Wê xebat kir ji bo çanda kurd ji bîr nebe

Dengbêjî ji jinê dest pê dike. Jinê her êş û kesera dilê xwe bi rêya stranê daye der. Dengbêj Gazin li dijî astengiyan dev ji hunera xwe berneda. Di Radyoya Erîvanê de Meryem Xan û Eyşê Şan guhdarî dikir û li ser şopa wan hunera xwe afirand.
Dengbêj Gazin (Raziye Kizil) ya 57 salî berî çend rojan qeyrana dil derbas kiribû û di 21’ê tebaxê de jiyana xwe ji dest da. Dengbêja xwedî dengê zîz û zelal bi salan stranbêjî kir û di rêya Meyrem Xan û Eyşe Şanê de meşiya.
Dengbêj Gazin, ji gundê Yasîce yê Tetwana Bedlîsê ye. Gazin ji 12 saliya xwe ve stranan dibêje.
Dengbêj Gazin heta niha gelek CD û kaset derxistine. Ji derveyî çend stranan hemû jî yê wê ne. Di heman demê de xwediyê jiberkek xurt e jî. Di axaftineke xwe de tîne ziman ku ew zêdetirî sed stranî jiber dizane û li ser vê taybetmendiya xwe jî wiha dibêje: “Ez zêdeyî sed kilamî jiber dizanim. Min stranên xwe qeydî teybê dikirin û hildianî. Gotinên stranên min hemû jî yê min in.”
Dengbêj Gazina ku di 15 saliya xwe de tê zewicandin, piştî zewacê li Wanê bi cih dibe. Di salên destpêkê yên dengbêjiya Gazin de hevserê wê qebûl nake lê piştre bi stranbêjiya wê razî dibe. Di salên destpêkê de birayê wê li tembûrê dixe û ew jî dibêje. Li malê dest bi derxistina kasetan dikin. Dengbêj Gazin ku heta niha 12 album derxistine, bûye sembola dengbêjên jin. Wê herî dawî bi dengbêjeke ermen Aşiq Leylê re albumek bi kurmancî û Ermenîkî derxist. Dengbêj Gazin xwediyê dengekî zîz û zelal e. Wê li ser rêya Eyşe Şan û Meryem Xanê dengbêjî kir. Gazin ji bo ku çanda dengbêjiya kurd û jina kurd têk neçe tiştên ku ji destên wê tê dike.
Dengbêj Gazin ji bo ku kelepûra kurdan nede jibîrkirin, ode- yeke mala xwe jî bi motîfên çanda kurdî xemilandiye.





## Perwerdehiya Zimanê Zigmakî

Sîpan ŞÎNDA

Li gelik dewletên Ewropa vê heftiyê dibistan vebîn û dest bi perwerdehiya salê kirin. Hinek ji wê heftiya bê destpê bikin. Ji ber kû pirrê dewletên Ewropa li gor pergala Eyaletan (Kanton) xwe rêve dibin, destpê kirina perwerdehiyê ji li gor eyaletan tê guhertin. Li Ewropa betlana havînê kurt e. Lêbelê di nava salê de ji bo zarok aciz nebin û bîna wan ji dibistanê teng nebe, gelik caran betlane hene. Zarokên hemî welatan, netewan bi kêf û coş dest bi perwerdehiya zimanê xwe dikin û fêrî zimanê xwe dibin. Ji xeynî zarokên Kurdan! Mixabin ev rewş ji bo zarokên Kurdan cudaye. Hemî zarok bi zimanê xwe ê zigmakî dest bi perwerdehiyê dikin, lê mixabin zarokên Kurdan ne tenê li welatê xwe de, herwiha li hemû dinyayê de bi zimanê biyaniyan dest bi perwerdehiyê dikin. Ev yeka henê jî talan kirina mejî û hişmendiya zarokên Kurdan bi xwe re tîne. Ji bo wan ne tenê zehmetiya fêr bûna zimanekî nuh e. Ji bo hişmendiya zarokên Kurdan weke erdhejekê ye. Ser û bin kirina binhişî û hişmendiya wan e. Di wî temenê xwe yê biçûk de, ji bo zarokekê ev derbeka herî mezine û birîneka pirr xedar e. Her çend di laşê wan de çi birîn venabin ji, lêbelê di binhişî û kesayetiya wan de birînek wisa vedibe, ev birîn heya mirinê baş nabe. Ev zarok heroj, her gav, her seht wê êşa vê birînê bikişînin. Ne tenê jiyana wan tê guhertin. Keseyetiya wan, xewnên wan, xiyalên wan, pêşeroja wan tê guhertin. Dû heftiya li ser hev me li ser pişavtinê nivîsî. Vaye dibistan vebûn. Zarokên Kurdan dikevin kelehên pişavtinê de! Li Ewropa weke hemî pergalên wan, pergala perwerdehiyê ji baş rûniştiye. Ev demeke dirêje ji Kurd koçî Ewropa dibin. Lê mixabin tişta xwiya dike, Kurdên çûne Ewropa pergala Ewropiyan hê jî fêm nekirine. Çima ez vê dibêjim? Doh min nûçeyek di derbarê perwerdehiya zimanê Kurdî ya li Elmanya de xwend. Serokê Yekitiya Mamosteyên Kurdî ya Ewropa dibêje li Elmanya ji milyonekê zêdetir Kurd hene lêbelê tenê 2200 zarokan ji bo dersa Kurdî bistînin serlêdan kirine! Qebeheta ji vê ji mestir, dibêje li Elmanya tenê 25 mamoste hene kû dersa Kurdî bidin! Li gor daxwiyaniya mamoste, serê 88 zarokan mamosteyek dikeve behra wan. Li Elmanya 1000 zarokên Kurd, ji ber kû mamostên Kurdî nînin nikarin dersa Kurdî bibînin. Başe kû hindik zarokan serlêdan kirine! Tişta xwiya dike, Kurdên çûne Ewropa hê ji wateya xwendinê fêm nekirine. Tevî hemî derfetan, mixabin zarokên xwe nedane xwendin. Bê goman ev şermeka mezine ji bo Kurdên Ewropî. Zagonên pirrê Dewletên Ewropiyan, ji aliyê perwerdehiyê ve mafî dide zarokên koçberan fêrî zimanê zigmakî bibin. Ev yeka henê ji bo zarokan mafekî wan yê xwezayî ye, miroviye. Lê mirov li kûderê be divê mirov bi xwe mafê xwe bistîne. Tu kes nabêje keremke ji te re hemî tişt. Nexazim zimanê dayîkê. Kurdan li hinik dewletên Ewropa ev maf bi dest xwe ve anîne. Lê mixabin ne li hemî deran. Ez bawerim mînaka herî baş ji Swêd e. Li Swêd herî kêm 200 mamosteyên Kurdî li dibistanan de perwerdehiya zimanê Kurdî didin. Herî kêm 10000 hezar zarok ji perwerdehiya zimanê Kurdî dibînin. Divê Kurdên Ewropa li ser mijara perwerdehiyê ji nû ve rûnin û mitale bikin. Gelo çima ew li Ewropa di nava pergalê de xurt nebûne? Ji ber kû zarokên xwe nedane xwendin. Mixabin ev rastiya Kurdên çûne Ewropa ye.

# Bi hewldana komîteyê çandinî pêşdikeve

**Li Eyn Îsa piştî ku komîteya çandiniyê hat avakirin, hewldanên pêşxistina çandiniya herêmê jî zêde bûn. Hevseroka Komîteya Çandiniyê Meryem Ersalan got: "Ji bo pêşxistina çandinî û kêmkirina barên cotkaran bi derfetên xwe yên heyî em piştgiriya cotkaran dikin."**

Komîteya Çandiniyê ya navçeya Eyn Îsa ji destpêka avabûne xwe de hewl da çandiniyê li herêmê pêş bixe.
Bi armanca şopandina karûbarên çandiniyê û piştgiriya cotkarên navçeya Eyn Îsa û bajarokên girêdayî wê(El-Hîşê, Ebû Xerze û El-Elî Baciliyê), Komîteya Çandiniyê hate ava kirin. Komîte girêdayî Komîteya Aborî ya Meclisa navçeya Eyn Îsa ye.
Ji destpêka avabûna xwe de, komîte rêjeya erdên çandiniyê derxist. Li gorî serjimariyê 46 hezar û 322 donim zevî hatine çandin û bi vî awayeî hatine belav kirin: 31 hezar û 420 donim pembo, 3 herzar û 740 donim garis, 3 hezar û 40 donim sebze û 7 hezar û 762 donim zebeş.
Her wiha komîte li gorî vê rêjeyê desteka pêwîst wê pêşkeş bike.
Ji aliyê din ve ji bo avdana zeviyan, Komîteya Çandiniyê sotemenî li gorî hêza her jeneratorekê û bi nirxek guncaw da cotkaran.
Komîteya Çandiniyê ruxset da cotkaran da ku her cotkar li gorî



erda ku çandî semad ji Mesrefa Çandiniyê ya Girê Spî bi deyn heta bidawîbûna demsalê bigire.
Ji bo pêşwazîkirina hilberîna demsala zivistanê sê navend (Eyn Îsa, El-Celebiyê û El-Dehlîz )vekir.
Girêdayî vê mijarê Hevseroka Komîteya Çandiniyê Meryem Ersalan got: "Ji bo pêşxistina çandinî û kêmkirina barên cotkaran bi derfetên xwe yên heyî em piştgiriya cotkaran dikin."
Meryemê got: "Ji bo ku bazirgan keysbaziyê li serê cotkaran nekin, me berhemên demsala zivistanê ji cotkaran re bi buhayên guncaw kirrî."…*ANHA*

## Yekkirin



Sîpan CAN

Ji destpêka mirovahiyê heya roja me ya îro, ji dema ku mirov çêbûn, ziman û çand jî bi xwe re derxistin holê. Niha li tevahiya cîhanê bi hezaran ziman, ol, çandên cud cuda hene. Li gorî lêkolînan di navber şeş hezar û heft hezar ziman di cîhanê de hene. Ji wan zimanan bi qasî ji sedî 60 heya 80 di sala 2100'î de ger zarok pê ne axifin wê nemînin û ber bi windabûnê ve biçin.
Dema em behsa vê mijarê dikin, mirov dibêje ma gelo ewqas hêsane zimanek bi dawî bibe û êdî ji ferhenga zimanên cîhanî sîl bibe? Belê, hêsan e û em dikarin şîrove bikin û bêjin çima?
Piştî şerên yekem û duyem yên cîhanê, hêzên global yên dagirkerên welatên cuda cuda bûn. mîna îngiltere, îspaniya her wiha fransa li cihên ku bûne serwer zimanê xwe dan fêrkirin û hemû zimanên welatên lê diman felc kirin. Em niha dibînin çawa li amerîka latîn zimanê ispanî serwer e. li nîvê dewletên Afrîkayê zimanê fransî serwer e, her wiha li nîvê cîhanê jî zimanê ingilîzî xwe wek zimanê gîştî ya cîhanê dide nîşandan.
Di bingeh de, eger em hinekî kûr û hûr pêde biçin, mirov dibîne ku di sedsala 20'an de çawa netew-dewlet hatin avakirin, pêre jî hewldanên yekkirina zimanê mirovan hat destpêkirin. Çawa ku di sîstema netew-dewlet de yek al, netew, ziman pêş dikeve, van sîstemên hegemon xwestin cîhanê hemû bikin yek. Em werin zimanekî wek ingilzî, heya berî sed salî jî kesî li cihanê pê nebihîstibû. Lê; piştî ku bû zimanê komputerê û gelek alavên din yên teknîkê bi awayekî zanabûn di nava cîhanê de belav bû. Êdî, mirov dev ji zimanê xwe ya dayîkê berdide û heyranê zimanê înglîzî û her wekî din zimanên ku-qaşo- kar pê tê meşandin dimînin.
Ji ber wê, gelek bi zanebûn zimanên resen di cîhanê de armanca van zimanên mitîngeran de ye. ango, ev ziman bi xwe mêtînger in. li kuderê dighêjin mêtîngeriyê li ser zimanên din dikin. ji xwe di pileya yekemîn de ingîlîzî ye. ku welatên mîna Amerîka û Inglîstanê dixwezin vî zimanî bikin tek zimanê di cîhanê de. Ango, sîstema kapîtalîzm a ku xwe dispêre yekkirina her tiştî.
Yê me wek kurd jî em ne dûrî vê metirsiyê ne. Zimanê ku neyê nivîsandin û wergerandin wê zû bi zû winda bibe. Bi hezaran berhemên kesên kurd hene, lê hemû jî bi zimanê mêtîngeran hatine nivîsandin. Berhemên bi zimanên din ji yên bi zimanê kurdî pirtirin. Dibe ku berê derfet nebû. Lê; bi gîştî niha li her çar parçeyên Kurdistanê li bakur nivîsakêrên kurd bi tirkî dinvîsin. Li Rojhilat bi farisî û li Sûriyê û Îraqê bi erebî dinvîsin. Lewra, zimanê kurdî di metirsiyê de ye. tevî ku niha li Rojava derfetên fêrbûna zimanê kurdî di asteke mezin de ye. lê; di 8 salên bihûrî de ji sedî yek ji rewşenbîr û nivîsakarên me ji bo kurdî xebatên nivîsandinê nakin. Bi rêjeyek gelek mezin gotarnivîs bi erebî ne. Helbestvan berhemên xwe bi erebî ne. Romannivîs tevî ku gelek kêmin; lê bi erebî dinvîsin. Ev rewş êdî divê were guhertin, çareya wê çibe bila bibe, divê di zûtirîn dem de bê peyda kirin. Ev berpirsiyartî di asta herî bilind de dikeve ser milê nivîskarên kurd ku bi kurdî binvîsin. An jî, wê kurd dîsa di destara yekkirina zimanê global de bê hêrandin.

# Di demek kurt de xebatên mezin hatin kirin

Şaredariya Gel a Til Birakê gelek xebatên xizmetguzariyê di demek kin de pêk anî. Şaredarî ji bo dema pêş jî amadekariyên hin projeyên din dike.
Piştî hilbijartinên meclisên herêmî û şaredariyan ku di dawiya sala 2017`an de pêk hatin û rêveberiyên nû hatin hilbijartin, Şaredariya Gel a navçeya Til Birakê ya girêdayî kantona Qamişlo jî, gelek xebatên xizmetguzaiyê pêk anî.
Şaredariyê, navçe bi temamî ji bermahiyê şer paqij kir. Di 4'ê Nîsanê de parkek vekir. Şaredariyê, park ji hemû aliyan ve ji çandina daran û kulîlkan heta çêkirina cihên rûniştinê amade kir, da ku walatî bikaribin bi hêsanî berê xwe bidin parkê.
Şaredariya Gel a navçeya Til Birakê riya di navbera gundê Misîlê û Ekar bi dirêjahiya 4 km û firehbûne 6 metre qîr kir. Şaredarî riyên di nav navçeyê de sererast kir û riyek nû ku navçeyê bi gundê Simêhan ve girê dide vekir.
Şaredariyê toreyên kanalîzasyonê di nav taxan de bi dirêjahiya 500 metre dirêj kir û av gihişt nêzî ji sedî 80 ji şêniyên navçe û gundên girêdayî wê. Deverên ku av nagihêjin, şaredarî du sahrîcên avê eyar kirine da ku avê bighîne wan gundan.
Di çarçoveya xebatên Şaredariya Gel a nvaçeya Til Birakê, Hevserokê Şaredariyê Lezgîn Mihemed destnîşan kir ku ew li gorî derfetên xwe yên heyî xebatên xizmetguzariyê ji şêniyan re pêşkeş dikin. Lezgîn diyar kir ku wan dermanê mêşûmoran li tevahiya navçeyê reşandine. Lezgin bi bîr xist ku zabîteya şaredariyê jî bi awayekî asayî ji bo birêxistinkirina sûkan li ser karê xwe ye.
Lezgîn diyar kir ku sê şaredariyên nûjen, şaredariyên bajarokên Til Himêdî, Simêha rojava û Im Hicêrê girêdayî Şaredariya Gel a navçeyê ne û hemû komîteyên wan şaredariya hatine aktîvkirin û wiha got: "Piştî veqetandina budçeyên şaredariyên nû, dê dest bi xebatê bikin."
Şaredariya Gel a navçya Til Birakê garaceke taybet ji bo tirimpêlên veguhestinê ava kir. Her wiha çerxeriya navçeyê sererast kir.
Hevserokê Şaredariya Gel a navçeya Til Birakê, ji Desteya Şaredariyan a Herêma Cizîrê xwest ku ji bo paqijkirina navçeyê ji bermahiyên DAIŞ'ê ji wan re alavên xizmetguzariyê peyde bikin…*ANHA*



# Koçberên kampa El Recim El Ebyed li benda alîkariyê ne



Bi sedan malbatên ku ji bajar û deverên Sûriyê koçber bûne, li kampên belavbûyî yên li gundewarê Reqayê bi cih bûne.
Êş û zehmetiyên wan ji ber xemsariya rêxistinên mirovî zêde dibin. Yek ji wan kampan jî Kampa El-Recim El-Ebyed e.
Kampa El-Recim EL-Ebiyed 25 km li rohilatê bajarê Reqayê ye. Li kampê nêzî 700 malbat bi cih bûne. Rêxistinên mirovî yên navnetewî li hember rewşa kampê xemsar tevdigerin û alîkariyê nadin.
Zehmetî û êşên koçberên Kampa El-Recim El-Ebyed ji ber xemsarî û ne dayîna alîkariyên mirovî, zêde dibin. Alîkariya ku tê dayîn jî têra wan nake. Gelek caran rêxistinên mirovî soza alîkariyê dan, lê soza xwe bicih neanîn.
Kamp li nêzî zevî û kanalên avdanê ji bo peydekirina ava vexwarinê hatiye avakirin. Lê koçberên kampê ji ber kêmbûna alîkariyê û peritîna konên wan zehmetiyan dikşînin.
Koçberê bi navê Amir El-Xalid ku ji gundewarê Dêrazorê ye êş û zehmetiyên xwe anî ziman û wiha got: ″Em ji soz û gotinên rêxistinên mirovî aciz bûn. Karmendên wan tenê serjimariyê dikin. Hêviya me ji sozên wan nema."
Amir diyar kir ku ev nêzî salekêye li kampê dimîne, ji bo bicihanîna debara malbata xwe rojane di zeviyan de dixebite, hin caran jî pereyên ku digre bi malbatên din re parve dike û wiha pê de çû: ″Lê niha ji ber paşdeçûna demsala çandinyê, cotkar ji bo kêmkirina lêçûnan nema karkeran dixwazin.″
Ji aliyê xwe ve dayîka Ebdulkerîm ji sozên rêxistinên mirovî aciz bûye û wiha got: "Rêxistinên mirovî tenê hejmara koçberan û rewşa wan a aborî tomar dike. Lê ev xebat bê encam e, tenê tomarkirine. ji beriya salekê ve, tenê du caran alîkarî pêşkeşî me kirin û ew jî têra me nekir. Hin koçberan alîkar birin û hinek jî alîkarî negihîşt wan.″
Koçbera ku nexwest navê xwe eşkere bike, hêvî kir ku ji bo şopandina xebatên belavkirina alîkariyan ji aliyê rêxistinan ve alîkarî bi awayekî wekhev were belavkirin, komîteyek çavdêriyê bê avakirin…*ANHA*



# Dixebite da ku deh zarokan xwedî bike

***Jina Ereb Sîlda Xelef Heco yek ji mînakên xebatkarî û fedekariya jinê ye. Sîlda ya ku li Taxa Şêxmeqsûd a Helebê rûdinê ji bo ku deh zarokan xwedî bike bi şev û bi roj di firin û dikanê de dixebite.***



Sîlda Xelef Heco li taxa Şêxmeqsûd a Helebê rûdinê. Sîlda ji bo ku 10 zarokan xwedî bike şev û roj dixebite.
Sîlda 26 salî ye û ayîka 4 zarokan e. Sîlda ji bo xwedîkirina zarokên xwe sibehan di firina nan a malbatê hevserê xwe de dixebite û piştî nîvro di dikana firotina madeyên xwarinê de dixebite.
Sîlda bi eslê xwe Ereb e. Beriya




4 salan ji bo kar hevserê wê çû dewletên derve. Niha ji ber rewşa şer nikare vegere.
Piştî şehadeta du birayên hevserê Sîldayê, Sîlda neçar ma ku alîkariya bavê hevjînê xwe bike. Ji ber wê li gel bavê hevjînê xwe di firinê de dest bi kar kir û xebatên firinê birêxistin kir.
Beriya meh û nîvekê bavê hevjînê wê jiyana xwe ji dest da. Niha ew tenê firina Qehreman bi rêve dibe. Di firinê de 5 karker dixebitin.
Sîlda rojane di 4:00 sibehê de ji xew radibe û berê xwe dide firinê.
Sîlda ji bo xwedîkirina 4 zarokên xwe û 6 zarokên her du tiyên xwe ku di encama êrîşên çeteyan de şehîd ketine, piştî nîvro di dikanek firotina madeyên xwarinê de dixebite.
Sîlda di dikana nêzî mala wê de heta derengiya şevê dixebite.
Sîlda derbarê rewşa xwe de wiha got: "Ez li gel bavê hevjînê xwe di firinê de xebitîm. Niha piştî ku apê min çû ser dilovaniya xwe, ez xebata firinê beyî alîkariya kesekî dimeşînim."…*ANHA*

# Doktorên jin xetereya mirinê kêm dikin



Li gorî lêkolîneke ku li DYA'yê hate kirin, dema ku tedawiya jinên krîza dil derbas kirine ji aliyê doktorên jin ve tê kirin, rêjeya mirinê kêm dibe.
Zanîngehên Harvard, Mînnesota û Saînt Loûîsê li ser jinên li Florîdayê krîza dil derbas kirin lêkolînek kirin. Encamên lêkolînê li kovara zanistî ya bi navê Proceedings of the National Academy of Sciences (PNAS) hate weşandin.
Li gorî lêkolînê, dema ku tedawiya jinên nexweş ên krîza dil derbas kirine bi destê doktorên jin tê kirin, rêjeya mirina nexweşan 5,4 ji sedî kêm dibe. Pisporan destnîşan kirin ku rêjeya 5 ji sedî ji aliyê statîstîkî ve gelekî girîng e.
Di lêkolînê de dosyayên klînîkê yên 500 hezar nexweşên di navbera salên 1991 û 2010'an de krîza dil derbas kirine, hatin nirxandin.
Di lêkolînê de hate ragihandin, di nava jinên ku ji ber krîza dil rakirin servîsên lezgîn de rêjeya mirinê 11,9 e. Li gorî lêkolînê, eger doktoreke jin dest bi tedawiya nexweşeke krîza dil bike, rêjeya mirinê 5,4 kêm dibe.
Beriya niha di lêkolînan de hatibû tespîtkirin ku di dema krîza dil de rêjeya mirina jinan ji ya mêran zêdetir e. Ji ber cudahiya semptomên jinan, derengxistina tedawiyê û serlêdana bi derengî ya li servîsên lezgîn, rêjeya jinên ku ji ber krîza dil dimirin zêde ye.

# Konferansa jinên Kurd ya navnetewî di 6-7'ê Cotmehê de pêk tê



Jinên kurd di Konferansa Navneteweyî de di 6'ê Cotmehê de li bajarê Frankfûrt ê Elmanyayê kom dibin.
Jinên Kurd, wê di konferanseke navnetewî de li Frankfûrtê bicivin. Konferans wê di navbera 6-7'ê Cotmehê de pêk bê. Di konferansê de wê gelek mijarên jinên cîhanê û jinên Kurd eleqeder dike, bên destgirtin û ji bo têkoşîna hevpar jî plansazî werin pêşxistin û biryar werin girtin. Çend ji mijarên ku di konferansê de bên nirxandin wiha ne:
"- Em çawa dikarin sedsala 21'ê bikin sedsala jinê?
- Li dijî neheqiya di hatineyê tê kirin, li hemberî êrîşên zayendîparêz û faşîst, em çawa dikarin xwe biparêzin?
- Em çawa dikarin bi hev re pirsgirêkan binirxînin, biryarên hevpar bidin û bixin meriyetê?
-Em çawa dikarin bi hev re bi pêş ve biçin?"

# Çeteyekî destdirêjî li jinekê kir



Li bajarê Efrînê, piştî ku serçeteyekî Lîwa Silêman El-Şah destdirêjî li dijî jineke ji Xûtayê kir, rewşeke tevlîhev di navbera çeteyan de derketiye.
Li ser torên civakî dîmena jinekê bi navê Esra Yûsif a 19 salî, dibêje ku ew zewîciye û serçeteyê bi navê Ebû Emşe ya girêdayî artêşa tirk a dagirker bi darê zorê û gefxwarinê destdirêjî li wê kiriye, hate belavkirin.
Çavkaniyekî ji hundir bajarê Efrînê ragihand ku komên çete yên bi navê ″Kombûna Ehrar El-Şerqiyê, Cebhe El-Şamiyê, Ehrar El-Şam, Firqa Nehan, Kombûna Edel, Focê Pêncan, Firqet El-Sultan Ebd Hemîd û Firqet El-Hemze" qaşo ji bo tunekirina hebûna çeteyên Lîwa Silêman Şah, odeyeke çalakiyan bi navê″ Lebeykî ya uxtah″ ava kirine.
Piştî ku ev dîmen hate belavkirin, çeteyan rêyên sereke yên bajarê Efrînê girtine û tevlehevî derketiye.

# Leyla Bîrlîk hat berdan

Parlementera berê ya HDP'ê Leyla Bîrlîk hat berdan.
Hat diyarkirin ku Parlementera HDP'ê ya Şirnexê ya berê Leyla Bîrlîk du roj berê ji bajarê Tirkiyê Edîrneyê derbasî bajarê Orestiada yê Yûbanîstanê bûye.
Li gorî nûçeya BBC Tirkî hat diyarkirin ku Bîrlîk bi rêyên derqanûnî derbasî Yewnanîstanê bûye û ji Yewnanîstanê daxwaza hêwirandina siyasî kiriye.
Hat diyarkirin ku Bîrlîk anîne deriyê sînor ê Dedeagaçê û hatiye binçavkirin û agahiya Wezareta Karên Derve pê hatiye xistin. Hat gotin dê Komîsyona Penaberan biryara hêwirandina siyasî ya Bîrlîkê bide.



# Wezîrê Tirk ji bo Îdlibê li xwe mikur hat

***Di demekê de ku rejîma Sûriyê amadekariyê ji operasyona li dijî Îdlibê dike, Wezîrê Karên Derve yê Tirk Mevlûd Çavûşoglû li Moskowayê bi Wezîrê Karên Derve yê Rûs Sergey Lavrov re rûnişt. Çavûşoglû li xwe mikur hat û da zanîn ku li Îdlibê hin komên radîkal gelê sivîl aciz dikin. Ev gotin weke nîşana lihevkirinê hat şîrovekirin.***

Wezîrê Karên Derve yê Tirk Mevlûd Çavûşoglû li Moskowayê bi hempîşeyê xwe yê Rûs Sergey Lavrov re rûnişt. Têkiliya Enqere ya bi Moskowayê re bi gotina 'dexesî' pênase kir û di mijara Îdlibê de li xwe mikur hat.
Di demekê de ku rejîma Sûriyê amadekariyê ji operasyona li dijî Îdlibê dike û têkiliyên navbera dewleta Tirk û DYA'yê re aloz e, hefteyên dawî di navbera Enqere û Moskowayê de gelek hevdîtin pêk hatin.
Wezîrê Karên Derve yê Tirk Mevlûd Çavûşoglû bi hempîşeyê xwe yê Rûs Sergey Lavrov re li Moskowayê rûnişt.
Lavrov piştî hevdîtinê di civîna çapemeniyê de axivî û bal kişand ser meseleya vîzeyê. Lavrov got, "Weke aliyê Rûsyayê, me piştrast kir ku ji bo hêsankirina vîzeyê ji bo welatiyên Tirk ên li hin kategoriyan, em ji danûstandinan re amade ne. Û di demeke kin de em ê vê mijarê binirxînin. Me li hev kir ku ji bo peymanên di vê mijarê de bên amadekirin, mekanîzmaya şêwirmendiyê were avakirin."
Lavrov di mijara Îdlibê de diyar kir ku wezîrên karên derve û wezîrên parastinê yên Rûsya û Tirkiyê wê li Moskowayê li hev rûnên û qala civîna bi formata 2+2'an kir.



Wezîrê Parastina Millî ya Tirk Hûlûsî Akar û Serokê MÎT'ê Hakan Fîdan piştî serdana Moskowayê ya 17'ê Tebaxê, vê Înê jî berê xwe dan Moskowayê. Akar û Fîdan bi Wezîrê Parastinê yê Rûsyayê Sergey Şoylû re rûniştin. Lavrov diyar kir ku di hevdîtinê de ya bi beşdariya wezîrên parastinê û saziyên îstîxbaratê yên Rûsya û Tirkiyê, mijara Îdlibê hatiye nirxandin û got, wan giranî dane ser mijara 'mûxalîfên nerm' ji yên din. Lavrov da xuyakirin ku weke wezîrê karên derve wê di vê mijarê de bi wezîrê parastinê re civînekê li dar bixe, lê mebesta xwe ji "mûxalîfên nerm" eşkere nekir. Temamiya çeteyên li Îdlibê ku Tirkiye destekê dide wan, bi El Nûsra û DAÎŞ'ê ve girêdayî ne.
Mevlut Çavûşoglû ku bi Lavrov re daxuyanî da çapemeniyê got, "Ji bo ku em têkiliyên xwe ji hemû aliyan ve bînin asta herî bilind em kêferatê dikin."
Çavûşoglû wiha got: "Lîderên me gelek caran têne cem hev. Ev hevkariya ji nêz ve dike ku hin dost û kes dexesiyê dikin. Rûsya ji bo me hevkarê stratejîk e."
Daxuyaniya Lavrov a bi rengê 'komên nerm' ji hêla Çavûşoglû ve hate qebûlkirin. Çavûşoglû anî ziman, li Îdlibê hin komên radîkal gelê sivîl aciz dikin û got, "Divê em terorîstan û mirovên din ji hev veqetînin. Ji bo me hemû rêxistinên terorîst yek in." Çavûşoglû negot bê ka ew behsa kîjan koman dike, lê ev gotin weke nîşana lihevkirinê hatin şîrovekirin. Ne tiştekî veşartî ye ku têkiliya komên çete û hevkariya wan bi Enqereyê re heye. Li ser siberoja Îdlibê çima bi Tirkiyê re diaxivin jî vê bi rengekî zelal derdixe holê.
Çavûşoglû got, çareseriya leşkerî ji bo siberoja Sûriyê wê bibe 'bobelat'. Çavûşoglû got, "Li şûna ku mirov êrîşê bi ser Îdlibê de bibe, em çawa dikarin çareser bikin, em divê li ser vê bixebitin."

## PDK bila bersiv bide

Endamê Nifşê Nû Hewreman Secadî diyar kir ku bêdengiya PDK'ê li hemberî daxuyaniya KCK'ê ya 'guman heye PDK'ê di êrîşa ser Şengalê de alikarî dabe Tirkiyê', got ku ger wisa nîne bila PDK bersiv bide.
Dewleta Tirk di 15'ê Tebaxê de êrîşa hewayî dijî Şengalê pêk anî. Di encamê de Endamê Koordînasyona Civaka Êzidî û Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Zekî Şengalî şehîd bû. Lê heya niha ne partî û ne jî hikûmeta Herêma Kurdistanê li hemberî vê êrîşê ti helwestek nîşan nedaye. Iraqê jî bi daxuyaniyekê got 'di navbera me û Tirkiyê de li ser êrîşê ti lihevkirinek nîne'.
Li ser daxuyaniya hikûmeta Iraqê û bêdengiya PDK'ê endamê Tevgera Nifşê Nû Hewraman Secadî axivî û diyar kir ku divê Iraq helwestek pratîkî nîşan bide û tenê bi şermezarkirinê nemine.
Li ser helwesta aliyên Başûrê Kurdistanê ku ji derveyî Tevgera Azadiya Civaka Kurdistanê, Eniya Demokrasiya Gel û Partiya Azadî û Demokrasiya Êzidiyan (PADÊ) ti aliyek din helwest nîşan neda, Secadî diyar ku cihê xemgîniyê ye ku alî li hemberî sûcek wiha bêdengin.
Secadî îşaret bi bêdengiya PDK'ê ya li hemberî êrîşê kir û got; "Li herêmê PDK xwedî desthilate. Dikare ji bo Tirkiyê hêsankarî bike.



Bêdengî cihê gumanê ye. Ger wisa nîne dikare êrîşê şermezar bike û bêje wisa nîne."
Secadî diyar kir ku divê li Parlamentoya Iraqê kar li ser bê kirin ji bo serweriya xaka Başûr neyê binpêkirin û destûr neyê dayîn hêzên dagirker li gor dilê xwe bikevine nav xaka Başûr…***ROJNEWS***

## Rûsyayê ji bo Îdlibê pêşniyar li Tirkiyê kir



Wezîrê Parastinê yê Rûsyayê Sergey Şoygû,di hevdîtina li gel Wezîrê Parastiyê yê Tirk Hûlûsî Akar de, têkildarî Îdlibê pêşniyar kirin.
Li gorî ajansa nûçeyan a Înrterfaxê, Şoygû ji bo çaresekirina nakokiyên li bakurê rojavayê Sûriyê ya bi Tirkiyê re pêşniyar pêşkêş kirine.
Wezareta Parastinê ya Rûsyayê, Soygû têkildarî hevdîtina bi Akar û Serokê MÎT'ê Hakan Fîdan re kirî daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de ev tişt hate gotin: "Hevdîtina di navbera Şoygû, Akar û Fîdan a hefteya borî li Moskovayê berfirhe hatibû destpêkirin dewam dike. Aliyê Rûsya, ji bo aliyê Tirkiyê ji bo asayîkirina rewşa li Bakurê rojavayê Sûryê pêşniyar kirine."
Têkildarî naveroka pêşniyaran ti agahî nehatin parvekirin. Rejîma Tirk, destekê dide komên çete yên li Îdibê. Her wiha li herêmê 12 nuqteyên dewleta Tirk a çavdêriyê hene.
Komên çeteyên din ên ji herêmên din ên Sûriyê hatine derxistin li Îdlibê hatine komkirin. Her wiha nêzî 3 milyon kes li vê hermê dijîn.

**TÊKILIYÊN ME KÛR DIBIN**

Ji aliyê din ve Serokê Dewleta Rûsyayê Pûtîn got: "Têkiliyên me yên bi Tirkiyê re hem kûr dibin û hem jî bi naverokên nû dewlemend dibe. Hevkariya me di mijarên herêmî û aborî de zêde dibe."
Serokê Dewleta Rûsyayê Vladîmîr Pûtîn, bi Wezîrê Karê Derve Mevlût Çavuşoglu, Wezîrê Parastina Milî Hulusî Akar û Serokê MÎT'ê Hakan Fîdan re hevdîtin pêk anî. Putîn der barê hevdîtinê de daxuyanî da û got: "Têkiliyên me yên bi Tirkiyê re hem kûr dibin û hem jî bi naverokên nû dewlemend dibe. Hevkariya me di mijarên herêmî û aborî de zêde dibe."

## Îdlib navenda El Qaîde û Ixwanî Muslimîne

Îyad Xetîb diyar kir ku pêşketinên li Idlibê rû didin di encama planên navnetewî û herêmî de pêk tên.
Rêveberê Buroya Çapemenî ya Partiya Sûriya Paşerojê û Endamê Meclîsa wê ya giştî Îyad Xetîb diyar kir ku dewletên herêmî der barê Idlibê de li ser rêbazekî taybet lihev nekirine. Xetîb da zanîn ku dewleta Tirk naxwaze Cebhet El-Nusra bihelîne lê belê hewl dide endamên wê beşdarî nava tabûrên din bike .
Îyad Xetîb derbarê rewşa Îdlibêd e wiha got, "Hêzên navnetewî û herêmî Idlib veguhertin spartgeha hemû kesên li dijî rêjîma El-Esed û hê jî xwe dispêrin çareseriya leşkerî." Xetîb rewşa niha ya Idlibê weke baregeheke rêxistina El-Qaîdê û Ixwan Muslimîn ku alîkariya xwe ji Tirkiyê digirin, bi nav kir.
Xetîb wiha dewam kir, "Li ser Îdlbiê heta niha lihevkirinek li ser rêbazekî diyar pêk nehatiye. Rûsya hewl dide parêzgeha Idlibê bêyî ku dijberiya berjewendiya Tirkiyê bike û bêyî ku hêza leşkerî ya mezin bikar bîne, ji rêjîma Sûriyê re vegerîne."
Xetîb destnîşan kir ku pilana Tirkiyê derbarê Idlibê de ew e ku Idlibê jî rasterast bixe bin serweriya xwe weke Cerablûs û Babê û bêyî ku hevkarê xwe yê mezin Heyet Tehrîr El-Şam (Cebhet El-Nusra) winda bike û got, "Tirkiye hewl dide endamên wê beşdarî nava tabûrên din ên çekdar ku girêdayî Ixwan Muslimîn in, li Idlibê bike."
Xetîb diyar kir ku guman heye wê çeteyên girêdayî Tirkiyê ji Idlibê



ber bi herêmên gundewarê Helebê weke Efrîn, Cerablûs û Babê ve bêne veguhestin û wiha got: "Dibe ku Rûsya û Tirkiye rê li pêşiya komên çete vebikin da ku ber bi gundewarê bakurê Helebê ve bêne veguhestin û li dijî projeya federalîzma demokratîk a Bakurê Sûriyê bêne bikaranîn. Her tişt ji Rûsya derdikeve. Rûsya dest ji exlaqên xwe berda da ku berjewendiyên xwe bi Tirkiyê re biparêze."
Xetîb wiha pêde çû, "Komên DAIŞ'ê li Idlibê hene û di bin parastinaTirkiyê û istixbarata Tirkiyê de tevdigerin. Tirkiyê beriya niha jî ev kom di şerê li dijî Efrînê bikar anîn û niha jî pêdiviya veguhestina van bi erêkirina Rûsyayê heye."
Xetîb li ser daxuyaniya hin meclîsên herêmî yên Idlibê ku dixwazin xwe ji Sûriyê veqetînin û beşdarî Tirkiyê bibin wiha axivî: "Piraniya meclîsên herêmî yên li Idlibê li Tirkiyê hatine avakirin û Tirkiye van meclîsan finanse dike. Evan meclîsên herêmî ti carî nûnertiya welatiyên Idlibê nakin û tenê nûnertiya berjewendiya fînansekarê xwe dikin. Di demeke nêzîk de hêzên niştimanî yên li Idlibê wê daxuyaniyekê li hemberî van hewldanan bidin û wê banga derketina Tirkiyê ji axa Sûriyê bikin."…***ANHA***



# Tirkiye S-400'an bikirre wê li dijî polîtîka me be


***Berdevkê Wezareta Karê Derve ya DYA'yê Heather Nauert derbarê kirrîna fuzeyên S-400 de ku Tirkiyê bi Rûsyayê re peyman mor kiriye got, "heke welatekî weke Tirkiyê yê endamê NATO'yê ye pergala S-400 bikar bîne, wê dijberî polîtîkaya me tevbigere. Wê li ser mueyîde bên kirin."***



Wezareta Karê Derve ya DYA'yê, eşkere kir ku dikarin li ser Tirkiyê ku bi Rûsyayê re peymana Pergala Parastina Hewayî ya S-400 mohr kiriye, mueyîdeyan pêk bînin.
Berdevkê Wezareta Karê Derve Heather Nauert, li ser pirseke ku Rûsya wê di sala 2019'an de pergala S-400 radestî Tirkiyê bike bersiva; "Min bi xwe nûçeyeke wiha nedîtiye lê heke rast be, ev ji bo me mijara fikaran e." da.
Nauert, anî ziman ku heke Pergala Parastina Fuzeyan a S-400 bistîne yekane welatê ku mueyîde lê bê kirin Tirkiye ye û wiha pêde çû: "Em li her devera cîhanê dij derdikevin ku hevkar û îtîfaqên me pergala S-400 bistînin. (...) Me bi awayekî eşkere ragihand ku kî vê pergalê bistîne wê li ser mueyîde bên kirin."
Berdevk Nauert got; "heke welatekî weke Tirkiyê yê endamê NATO'yê ye pergala S-400 bikar bîne, wê dijberî polîtîkaya me tevbigere. Ev jî nayê pejirandin."
DYA'yê di mijara S-400'an de beriya niha jî Tirkiye hişyar kiribû. Kongreya Amerîkayê, di encama dengdayîna ji bo butçeya parastinê ya 25'ê Tîrmehê hatî kirin de, firotina balafirên şer ên F-35'an a ji bo Tirkiyê dabû rawestandin.

## De Mîstûra Rûsya, Îran û Tirkiye vexwende Cinêvê

Nûnerê Taybet ê Sûriyê yê Neteweyên Yekbûyî (NY) Staffan De Mîstûra Rûsya, Îran û Tirkiye vexwende hevditinên li Cinêvê yên 11 û 12'ê Îlonê.
Li gorî daxuyaniyê, ku berdevkê De Mîstûra daye, nûnerê taybet ê Sûriyê yê NY'yê bang li sê welatan kiriye ku ji bo destûreke nû ya Sûriyê were danîn, ji bo avakirina komîsyoneke peywirdar gotûbêj bikin.
Tê payin ku bi welatên din re jî gotûbêj werin kirin. Di nav van de DYA jî heye lê dema hevdîtinan nehate aşkerekirin.
Rejîma Sûriyê bi Rûsya, Îran û Tirkiyê re destpêka sala 2017'an hevlayenî hevdîtinên Cinêvê pêvajoya Astana dabûne destpêkirin.
Ji hêla çareseriya siyasî ve ne li Cinêvê û ne li Astanayê heta niha ti encameke serkeftî derneketiye.
Hevdîtinên ku li Cinêvê plana wan hatiye danîn, di demeke wiha de pêk tên ku hema bibêje DAÎŞ'ê hemû deverên ku dagir kiribûn ji dest winda kiriye. Rejîma Sûriyê jî di vê demê de amadekariyên operasyona Idlibê ya ku di destê çeteyên Tirkiyê de ye dike.



## NY komkujiyên DAIŞ'ê yên li Şengalê lêkolîn dike



Neteweyên Yekbûyî (NY) dest bi lêkolîna komkujî û êşkenceya ku çeteyên DAÎŞ'ê li Kurdên Êzidî û gelê sivîl ê li Iraqê kiriye, kir.
Hate ragihandin ku lêkolînê di çarçoveya biryara Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî de dest pê kiriye. Biryar par bi yekdengî hatibû girtin.
Nameya ku Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî (NY) Antonîo Gûterres roja 17'ê Tebaxê şand Konseya Ewlekariyê, roja 23'ê Tebaxê hate eşkerekirin. Di nameyê de hate ragihandin ku karê lêpirsînerên Neteweyên Yekbûyî yên li ser sûcên çeteyên DAÎŞ'ê li dijî Êzidiyên li Şengalê û gelê li Iraqê kiriye, wê piştî 3 rojan dest ê bike. Ev yek jî tê wê wateyê ku lêkolînê roja 20'ê Tebaxê dest pê kiriye.
Gûterres di nameya xwe de diyar kir ku tîma lêpirsînê bi pêşengiya yek ji parêzerên pispor ê Brîtanyayî Karîm Asad Ahmed Khan de dest pê kiriye.
3'ê Tebaxa 2015'an piştî ku PDK'ê xwe ji Şengalê vekişand, çeteyên DAÎŞ'ê dest bi êrîşên qirkirinê kirin. Ji ber van êrîşan bi hezaran Kurdên Êzidî jiyana xwe ji dest dan, bi hezaran jin û zarok jî dîl ketin destê çeteyan.
Bi destwerdana şervanên YPG'ê û gerîlayên HPG'ê, pêşî li êrîşên çeteyên DAÎŞ'ê hatibû girtin.
Neteweyên Yekbûyî beriya niha biryarek dabû û komkujî û êrîşên li ser Şengalê weke "qirkirina potansiyel" pênase kiribû.

## Çete destdirêjiyê dikin û gefên kuştinê dixwin

Koma çete ya bi navê Lîwa Silêman Şah a girêdayî artêşa tirk a dagirker, gefa kuştinê li welatiyên Efrînê û Babê dixwe.
Koma çete gefê li gel dixewe ku ew li dijî bûyera destdirêjiya serçeteyê wan li dijî keçikeke ji Xûtaya Rojhilat dernekevin meşê.
Li ser torên civakî dîmena keçikekê bi navê Esra Yûsif a 19 salî, dibêje ku ew zewîciye û serçeteyê bi navê Ebû Emşe ya girêdayî artêşa tirk a dagirker bi darê zorê û gefxwarinê destdirêjî li ser wê kiriye, hate belavkirin.
Piştî ku ev dîmen hate belavkirin, li Efrînê tevheviyeke mezin çêbû û çeteyan rêyên sereke hemû girtin.
Koma çete ya bi navê Lîwa Sillêman Şah gef li şêniyên Babê û Efrînê xwar û got ku ew li dijî serçetey Ebû Emşe dakevin meşê, ew ê wan bikujin.



Li bajaroka Tilar a girêdayî bejahiya bakur a Helebê, di navbera koma çete ya bi navê Firqet El-Hemzat û Sultan Mûrad a girêdayî Lîwa Silêman Şah şer rû da..



### Hewariyên Kurd bi ser dikevin

Idrîs HENAN

Dema ku Hz. Îsa dest bi têkoşîna xwe ya li dijî koletiyê kir, hinek bawermendên bi doza wî li dorê civiyan û pêkve têkoşîna Hz. Îsa bi rê ve birin. Bawermendên Hz. Îsa bi navê hewariyan dihatin naskirin. Hewarî jî ew alîgirê dilsoz û wefedar ku mîna cawekî spî dilê wî ji her qisûr, fihêt û lekeyekê paqije ye. Ango destbirayê xweşbext ê pêxemberan e. Bi riya hewariyan bawerî, fikir û ideolojiya Hz. Îsa li her çar aliyên dunyayê belav bûn. Niha jî ev bo zêdeyî 2 Hezar salin beşek mezin ji mirovahiyê li ser hîm û rêgezên perspektîvên baweriya Hz. Îsa xwe bi rê ve dibe. Modela jiyana xwe jî li gorî wê hilbijartine.
Li cem me Kurdan ti pirsgirêka pêxemberan ne jî ya hewariyan nîne. Pirsgirêka me her hişmendî û ideolojî ye. Afrînerî û xuliqkariya rêbazên têkoşîna hemdem e. Vê xisleta me ya lawaz bandor li herikîna dîroka gelê Kurd a tije êş kiriye û destê neyar û dagirkeran li ser me dirêj kiriye. Trajediyên me gelek zêde kiriye. Di nav sîstema cîhanî de em bê pergal, statu û welat hiştine. Ev jî wek ku gelek difikirin, xwe naspêre fedekarî û cesareta gelê Kurd. Berovajî xwe dispêre dilpakî, bêbextî û destpîsiya Kurd. Ger em çavekî kurt li dîroka Kurdan bixin, her doza pêxember û hewariyên me li hemberî reşkujiyên destpîsên Kurdan darb xwariye. Neyarên Kurdan jî di vê ferqa dilpakiya Kurdan de ne. Ji ber vê jî her ji bo têkbirina doza Kurd awan û xinizên destpîs şixulandine. Bi hemû rêbazên qirêjiya çêker pêxember û hewariyên me hedef girtine û li kudera dunyayê be jî dest avêtinê.Piştî salên heftiyî û bi derketina ideolojiya nûjen a têkoşîn û berxwedana gelê Kurd, ev hevkêşe û kêmahî bi analîza kûr a dîroka gelekî bindest hate çareserkirin. Ango rêbazê têkoşneke hemdem ku xwe dispêra ders, ezmûn û fêmkirineke dîrokî ji bo biserxistina doza Kurd hate afirandin. Afrînerê wê jî Rêber APO û hewariyên wî bûn. Bi heman rêbaza Hz. Îsa hewariyên Rêber APO li çar aliyên dunya û Kurdistanê belav bûn û doza Kurd ji nav lepên destpîs û xinizan xilas kirin. Bi şêwazên fikra ku azadiya hemû gelan dihewîna nava xwe sûra ku serketina vê têkoşînê misoger dike bilind kirin. Destkeftiyên Kurdan yên îro jî şahidiya pêşengtiya wê paradîgmeya nûjen a ku Kurdan afirandiye dikin. Ji ber vê jî ev tevger, pêşengê û hewariyên wê beramberî êrîşên herî tund in.
Hemû dagirker û neyarên Kurdan ji bo têkbirina vê tevgerê bi salane li hev dicivin û plansaziyên qirkirina pêxember û hewariyên gelê Kurd xêz dikin. Bi cureyên herî qirêj û bi rêbazên qelandin, qirkirin û reşkujiyan hewl didin vê tevgera pêşeng têk bibin. Rima hemû êrişên wan ên bênaveber jî destpîsî û xiniziya gelê Kurd e. Li her çar aliyên Kurdistanê zexeliya Kurd li hemberî hewariyên Kurdan serferber kirine.
Dibe ku reşkujiya hewariyê Rêber APO Mam Şengalî ne ya dawî be, lê tekez ne jî satsyona dawî ya doza gelê Kurd e. Berovajî, wê bibe hêza têkbirina destpîsiya Kurdên xwefiroş û xiniz.
Heyanî ku rêbaza têkoşîna hewariyên Kurd xwe bispêre raman û ideolojiya Rêber APO ku ti têgehên binketinê nahewîne nava ferhenga xwe, wê doza Kurdan di riya rast de be. Berovajî wê jî, xwekujiya misoger e.